**Mukaddime, 2018, 9(2), 31-47**
**DOI: 10.19059/mukaddime.369647**

# Kovargeriya Akademîk a Kurdî li Tirkiyeyê û Pirsgirêkên Wê[*]

**Necat Keskin**[1]

**Kurte:** Kovargerya kurdî di nav weşangeriya kurdî de cihekî girîng digire. Kovara Rojî Kurd a di sala 1913an dest bi weşanê kiriye nimuneya pêşî ya kovargeriya kurdî ye. Mînakên din ên sereke *Jîn* û *Hawar* in. Ji Hawarê û wir çi siyasî çi çandî curbecur kovarên kurdî derdikevin. Di salên dawî de bi vekirina enstîtuyên zimanên zindî kovarên akademîk jî dest bi weşanê kirine. Di vê xebatê de li ser kovarên akademîk ên kurdî ku li Tirkiyeyê diweşin hatiye rawestin ku heta niha tevde pênc heb in. Weşana van kovarên akademîk bi pêwîstiyên demê re têkildar e. Di heman demê de bi hebûna xwe ev kovar di warê kovargeriya kurdî a li Tirkiyeyê de destpêkeke nû pêk tînin.
**Bêjeyên sereke**: Kurdî, weşangerî, kovargerî, akademîk, Tirkiye.



## Türkiye'de Kürtçe Akademik Dergiciliği ve Sorunları

**Öz:** Kürtçe dergi yayıncılığı Kürtçe yayıncılık içinde önemli bir yer tutmaktadır. 1913'te yayınlanmaya başlayan Rojî Kurd dergisi Kürtçe dergiciliğinin ilk örneğidir. Diğer önemli olanlar *Jîn* ve *Hawar*'dır. *Hawar*'dan bu zamana kadar gerek siyasi gerek kültürel çeşitli Kürtçe dergiler yayınlanmıştır. Son yıllarda Yaşayan Diller Enstitülerinin açılmasıyla birlikte akademik dergiler de yayınlanmaya başlanmıştır. Bu çalışmada şimdiye kadar sayıları beş olan Türkiye'de yayınlanan Kürtçe akademik dergiler üzerinde durulmuştur. Bu dergilerin yayınlanması günün ihtiyaçları ile ilişkilidir. Aynı zamanda bu dergiler varlıklarıyla Türkiye'deki Kürtçe dergicilik alanında bir başlangıç oluşturmaktadırlar.
**Anahtar Kelimeler:** Kürtçe, yayıncılık, dergicilik, akademik, Türkiye

[*] Ev gotar bingeha xwe ji parçeyekî teblîxa bi navê "Rewşa Akademî û Weşangeriya Akademîk a Kurdî li Tirkiyeyê" distîne ku di konferansa bi navê "First Biennial Conference of IISKS/Frankfurt" (16-19 Îlon 2017) de bi devkî hatiye pêşkêşkirin. Bi lêzedekirina agahî û çavkaniyên nû, wek gotar ji nû ve hatiye sazkirin.

[1] Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, TYDE, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, necatkeskin@gmail.com

**Makale Gönderilme Tarihi: 21.12.2017, Kabul Tarihi: 25.09.2018**

## Kurdish Academical Magazine Publishing in Turkey and the Problems of It

**Abstract:** Kurdish magazine publishing has an important place in Kurdish publishing. The *Rojî Kurd* magazine, which started to be published in 1913 is the first example of Kurdish magazine publishing. Other important ones are *Jîn* and *Hawar*. From Hawar onwards, whether political and cultural, various Kurdish magazines have been published. In recent years, academic journals have also started to be published with the opening of Living Language Institutes. This study focuses on the Kurdish academic journals, which are only five, published in Turkey. The publication of these journals is related to the needs of the day. At the same time these magazines, with their presence, constitute a starting point in the Kurdish magazine publishing field in Turkey.

**Keywords:** Kurdish, publishing, magazine publishing, academic, Turkey.

### Destpêk

Di lihevhatina li ser ziman û pêşketina zimanê akademîk de weşangerî û xebatên akademîk cihekî girîng digirin. Bi riya weşanan dikare bê gotin ku ziman zindî dibe û bi weşanên akademîk jî ziman dewlemendtir dibe.[2] Weşan "ziman" ji herêma xwe derdixe û digihîne hemû civakê ku civakê bi xwe dixe nava "texeyyul"ekê de (bnr. Anderson 2004). Di heman demê de, jî bi riya weşanên edebî ku bêhtir zimanê rojane di wan de tê bikaranîn, ziman zindî dimîne.



Ligel vê yekê, weşanên akademîk ku bi rê û rêbazên zanistî û li ser esasên wek objektivî, destnîşankirin, sînorkirin û çarçovedayîna mijarê, destnîşankirin û paldayîna referansan tên nivîsîn xwedî zimanekî cuda ne. Zimanê zanistî wek Korkmaz (2001) jî tîne ziman ji zimanê rojane cuda ye û xwedî termînolojî, ûslub û vegotineke xweser e.[3] Ev yek jî bi xwe re, hem ji aliyê peyvên nû (têgeh) û hem jî ji aliyê bikaranînê ve derfeta dewlemendbûna ziman tîne, an jî ziman dewlemendtir dike. Di nav weşanên akademîk de jî kovarên akademîk cihekî girîng digirin ku îro her diçe hejmara wan zêdetir dibe.[4] Kovarên akademîk jî ew kovar in ku bi rêzik, sazkirin û çarçoveya xwe ji kovarên din cuda dibin û ya girîng prosesa nirxandina gotarên di van kovaran de cih digirin ji aliyê hekemên xwedî asteke akademîk û di qadên xwe de pispor ve tê kirin. Bi vî rengî ev kovar di nav civaka akademiyê de

---

[2] Bêguman di zindîbûn û "dewlemendbûn"a zimanekî de li rex weşanê, perwerdeya fermî/nefermî ku xwîner-nivîserên wî zimanî zêde dike û bazar jî xalên din ên girîng in. Anderson van xalan bi geşedan û belavbûna netewperî ve têkildar dinirxîne (2004). Her yek ji van xalan hêjayî nirxandineke cuda ye, loma di vê xebata sînordar de ji bo cîdayîna van hemû xalan derfet tune ye. Ji bo nirxandineke giştî ku van xalan jî di nav xwe de dihewîne dikare xebata Anderson ya navborî bê nêrîn.

[3] Ji aliyê din ve ev yek bi têgehên "zanist" û "zanistî" û herweha proseya xebatên "zanistî" ve jî têkildar e. Lê belê, ji ber ku mijara sereke di vê xebatê de ne ravekirina têgehên "zanist" an jî "zanistî" ye li ser van têgehan û proseya "zanistî" nehatiye rawestin. Ji bo van têgeh û proseya zanistî wek mînak bnr. Birsen Gökçe (2012). Ji aliyên din, di vê xebatê de "weşanên akademîk" û "kovarên akademîk" bi pêşqebûla ku ew weşan û kovar rêbazên zanistî bi kar anîne, hatine qebûlkirin.

[4] Ev hejmar ew qasî zêde buye ku di nav wan de gelek "kovarên xapînok" (predatory journals) jî derdikevin holê. Her weha ev yek buye mijara nûçeyan jî Ji bo nirxandineke derbarê vê mijarê de bnr. Ulus (2013); ji bo nûçeyê jî bnr. Kolata (2013).

têkiliyekê dideynin û dibin amûrekî ragihandina di navbera akademîsyenan de. Di destpêka weşana kovarên akademîk de ku digihije 350 sal berê jî ev yek tê dîtin (Priem 2013). Di vê destpêkê de teknolojîya nû- çapkirin- û geşedana akademiyan jî cihekî sereke digirin.

Di nîveke duyem ya sedsala 17mîn de yekemîn akademiyên zanistî jî tên vekirin. *Leopoldina N. Akademie* di sala 1652an de li Elmanya; di sala 1960î de li Ingilîstanê *Royal Society* û di sal 1966an de jî *Academie des Sciences* li Fransayê tên damezrandin (Akbulut 2016).

Kovara *Philosophical Transactions of the Royal Society (Phil Trans)* ku wek yekemîn kovara akademîk tê binavkirin jî ji aliyê Royal Society tê derxistin (Priem 2013; Singleton 2014; Akbulut 2016)[5]Henry Oldenburg kovara *Philosophical Transactions of the Royal Society (Phil Trans)* bi armanca bikaranîna teknolojiya ragihandinê ya nû ji bo ji bo belavkirina zanîna zanistî derdixe (Priem 2013).[6]

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ji bo kontrolkirin û bilindkirina asta nivîsan edîtorî, lijneya edîtoriyê û rêbaza hekemtiyê hat pejirandin û ev yek heta îro jî bi awayekî dewam dike (Priem 2013).

Ligel geşedanên siyasî, geşedanên ilmî jî di sedsala 19mîn de bandor li civaka Osmanî kir ku bûn sedemên guherînan Di nav van guherînan mînakên ewil ên kovargeriya akademîk tê dîtin. *Vekayi-i Tıbbiye* ku di sala 1849an de dest bi weşanê kiriye wek kovara ewil ya akademîk tê binavkirin (Kozak 2017). Lê wek Kozak jî dibêje geşedana bingehîn di kovarên akademîk de di dema Komara Tirkiyeyê de piştî salên 1930î pêk tê. Di vê serdemê de kovara *Belleten* (wek pirtûk jî tê binavkirin) wek weşana *Saziya Dîroka Tirk (Türk Tarih Kurumu)* di sala 1937an de tê çapkirin.[7] Di rewşa îro de hejmara kovarên akademîk, tenê yên li ser malpera fermî ya kovaran (dergipark.gov.tr.) ku di nav de yên kurdî jî cih digirin, 1737 e ku her diçe zêde dibe.[8]

Dikare bê gotin ku di van salên dawî de li Tirkiyeyê bi saya "enstîtuyên zimanên zindî" û beşên "ziman û edebiyata kurdî" derfetê weşanên akademîk ên kurdî jî zêdetir bûne.

Di vê gotarê de, di çarçoveya weşanên akademîk de, çi yên enstîtuyan û çi yên serbixwe, dê li ser kovarên akademîk ên kurdî û dîsa di vê çarçoveyê de li ser rewşa wan ya îroyîn û her weha pirsgirêkên wan ên heyî bê rawestin. Ligel vê yekê,

[5] Hejmara pêşî ya kovara *Journal des Sçavans* jî di sala 1665an de ji aliyê Denis de Sallo ve tê derxistin. Singleton dibêje ku ev kovar ji hêla hinek kesan ve wek yekemîn kovara akademîk tê binavkirin, lê ji ber ku di naveroka wê de mijarên curbecur û heta hikaye jî cih digirin ew vê payeye –wek gelek dîroknasan- nade vê kovarê. Loma kovara akademîk ya pêşî li gorî wî kovara *Philosophical Transactions of the Royal Society (Phil Trans)* e ku piştî kovara *Journal des Scavans* bi du mehan derdikeve. Ji aliyê din ve Akbulut kovara *Journal des Scavans* di nav kovarên akademîk ên ewil de dinirxîne. Bnr. Singelton 2013; Akbulut 2016). Ji aliyê din, Kozak dîroka derketina kovara *Phil Trans* ihtimaleke mezin bi xeletî wek 1662 nîşan dike. Bnr. Kozak 2017.

[6] Ji bo serboriya kovarê heta 2015an bnr. The Royal Society (2015).

[7] Ji bo agahî û hejmarên kevin ên kovarê bnr. https://ataturk.org.au/dergiler/belleten-dergisi-turk-tarih-kurumu/ (28.03.2018).

[8] Bnr. http://dergipark.gov.tr/ (28.03.2018).

kovarên derveyî vê prosesa nirxandina gotaran, lê di nav hewldaneke sazkirina vê prosesê de ne jî wek "kovarên nîv-akademîk" hatine binavkirin û bi kurtasî dê behsa wan jî bê kirin.[9]

Di sînorkirina mijar û mînakan de tişta li ber çavan hatiye girtin bêguman zimanê kovarê (an jî rêjeya zimanê kurdî yê kovarê) ye. Ji ber vê yekê jî, pênc kovarên ku an bi temamî kurdî ne (tevî zaravayen kurdî) an jî rêjeya gotarên bi zimanê kurdî ji yên din zêdetir in, wek mînak hatine girtin. Loma, kovarên wek *e-şarkiyat* ku dijîtal tê weşandin û gelek xebatên kurdî tê de cih digirin, ji ber kêmrêjeya gotarên bi zimanê kurdî û dîsa bi heman sedeman kovara *Mukaddime* ya Zanîngeha Mardin Artukluyê derveyî vê xebatê mane.

Ji aliyê din ve ev xebata berdest bêhtir xebateke teswîrî û çawanî ye û ji ber vê yekê jî tevî pirsgirêkên wan tenê li ser rewşa heyî yan kovarên akademîk yên kurdî disekine. Ev sînordayîn wek zarûretekê derdikeve ji ber ku wek mînak naveroka gotaran, mijar, bikaranîna ziman, nivîskar û pileyên akademîk ên nivîskaran, rêbazên hatine pejirandin, rêjeya daxistin û xwendina wan û faktora bandorê (Impact Factor) bi serê xwe dikarin bibin mijarê xebatên serbixwe. Nirxandina van xalan bi tevahî karê xebatên berfirehtir in û loma di vê xebatê de li ser van mijaran nehatiye rawestin. Di vir de armanca sereke xêzkirina wêneyekî giştî yên kovarên akademîk e ku li Tirkiyeyê tên weşandin.[10]



Ji bo tespîtkirina rewş û pirsgirêkan, ligel tecrubeyên şexsî yên nivîskar wek edîtorekî kovara *JMS* (The Journal of Mesopotamian Studies) û û wek hekemekî, du rêyên din jî hatine bikaranîn. Yêk ji van lênerîna malperên kovaran bi xwe ye ku gelek agahî dikarin ji wan bên bidestxistin; ya din jî rasterast têkiliya bi edîtorên kovaran re ye. Pirsên derbarê rewşa kovar û gotaran, bi çavên wan pirsgirêkên kovaran û bi giştî yên kovargeriya akademîk a kurdî bêhtir bi riya maîlan ji edîtorên kovaran re hatin şandin û bersivên wan di çarçoveya analîza giştî de hatin bikaranîn.

Kovarên akademîk ên kurdî piştî proseseke dirêj ya weşangeriya kurdî derketine meydanê û ji ber vê yekê jî bi kurtasî nerîneke giştî li ser kurtedîroka weşangeriya kurdî pêwîst e.[11]

---

[9] Binavkirina "kovarên nîv-akademîk" kêm be jî di lîteratûrê de cih digire. Kovarên "nîv-akademîk" wek kovarên *popûler* (Şentürk 2014:31); ên ku nivîsên wan xîtabî girseyeke berfirehtir dikin (Özel 2017) ; an jî *bêhekem* (Şenalp 2016) jî tên pênasekirin. Di vê çarçoveyê de kovarên *Vakıf ve Kültür Dergisi* (bnr. Çınar 2010; Tüfekçi 2017); *Ortadoğu Analîz*(Orsam 2013);, Keşkül (Özel 2017) wek kovarên "nîv-akademîk" hatine destnîşankirin Di vir de jî ji bo pênasekirina rewşa kovarên kurdî ku ne tam akademîk, xîtabî girseyeke giştî dikin, bêhekem in lê ne dûrî wê civakê ne jî ev binavkirin hatiye tercîhkirin.

[10] Wek mînak Nazmi Kozak ji sala 1997an û vir ve li ser kovarên akademîk ên Tirkiyeyê xebatan dimeşîne û ya pêşî jî wek pirtûk hatiye çapkirin (2003).

[11] Serboriya weşangeriya kurdî ya li Tirkiyeyê bêguman bi polîtikayên dewletê yên derbarê zimanê kurdî ve jî têkildar e. Lê ev yek mijareke din a serbixwe ye, nirxandineke cuda jê re divê û ji ber vê yekê jî derveyî çarçoveya vê gotarê dimîne. Ji bo nirxandineke derbarê polîtîkayên zimanî û rewşa kurdî bnr. Çiçek 2013.

**1. Kurtedîroka weşangerî û kovargeriya kurdî**

Weşangeriya kurdî di dema Osmanî de dest pê dike û yekemîn weşan jî wek rojnameya *Kurdistan* tê qebulkirin ku di 22ê Nîsan a sala 1898 an de hejmara yekemîn derdikeve (Bozarslan 1991; Kaya 2008; Acar 2010; Issı 2013; Arslan 2015). Wek ku Issı (2013: 128) jî tîne ziman ev rojname ne girêdayî komekê an jî rêxistinekê ye, û ji hêla Mîqdad Midhet Bedirxanê ku ji malbata Bedirxaniyan e li Qahîreyê tê çapkirin. Di sere pêşî de zimanê rojnameyê tenê kurdî ye (bi tîpên erebî), lê piştre nivîsarên bi zimanê tirkî jî tê de cih digirin (Bozarslan 1991: 6). Di hejmara yekem de Miqdad Midhet Bedirxan dibêje ku di dinyayê de çiqas misilman hebin hemû xwedî rojnameyê xwe ne, lê kurd wek qewmeke li ser dînê îslamê ji vê bêpar in; ligel ku camêr in, di dînê xwe de rast û qewî û xurt in, nexwende ne û nizanin bê li derdora wan çi dibe; Loma, wî jî di riya Xwedê de ev rojnameya ha nivîsî ye û navê wê jî kiriye "Kurdistan". Di dumahîkê de jî dibêje ku:

> Vê cerîdeyê de ez'ê behsa qencîya ilm û marîfeta bikim; li kuderê mirov dielime, li kuderê medrese û mektebên qenc hene, ez'ê nîşa Kurda bikim; li kuderê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawa şer dikin, tîcaret çawa dibe; ezê hemîya hîkat bikim.[12]

Bi tevahî 31 hejmarên rojnameya *Kurdistan* tên çapkirin û ya dawî jî di 14ê Nîsana 1902 ye. Piştî vê rojnameyê, di destpêka sedsala 20mîn de rojnameyên din wek rojnameya *Kürd Teavûn ve Terakkî Gazetesi* (1908)[13], *Şark ve Kurdistan* (1908), *Kurdistan* (1908) dest bi weşanê kirin (Kaya 2008:41-56). Ev yek bêguman bi rewşa çandî, civakî û siyasî ya deme ve girêdayî ye. Îlana Meşrutiyeta Duyemîn ya di 1908an de bi xwe re azadiyekê jî tîne û di vê rewşê de jî gelek rewşenbîrên kurd ku ji sirgûnê divegerin dikevin nav hewldanên siyasî û çandî de. Ev rewşenbîr dibin pêşengên komeleyên siyasî û çandî ku bandorê li ser weşangeriya kurdî jî kirine. *Kürdistan Azm-i Kavi Cemiyeti, Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti, Kürt Neşr-i Marif Cemiyeti* wek mînak dikarin bên dayîn (Kaya 2008:39-40; Arslan 2015: 39-55).

Di sala 1913an de renge weşana kurdî ber bi "kovargerî"yê ve diguhere û kovara kurdî *Rojî Kurd* (1913) ku ji hêla endamên Komeleya *Hêvî* (Kürt Talebe-Hevi Cemiyeti) dest bi weşanê dike.[14] Di heman deme de kovarên wek *Yekbûn* (1913), *Hetawî Kurd* (1913)[15] û *Bangî Kurd* jî (1914) derdikevin (Acar 2010). Ji bilî rojname û kovarên kurdî pirtûkên kurdî jî tên çapkirin (Malmîsanij 2007; Arslan 2015).



[12] Rojnameya Kurdistan ji hêla M. Emin Bozarslan ve di sala 1991ê de bi navê *Kurdistan: Rojnama Kurdî ya Pêşîn- İlk Kürd Gazetesi 1898-1902* ji nû ve hatiye çapkirin. Di vê xebata du-cildî de Bozarslan ligel hamançapî (tıpkıbasım) ya rojnamê, tîpguhezî û wergera wê ya tirkî jî cih digire. Bozarslan, her weha, di cîlda yekem di derbarê rojnameyê û naveroka wê de beşeke berfireh bi navê "pêşkêşî"yê (r. 1-108). Di jêgirtinan de ev xebata M. Emin Bozarlsan esas hatiye girtin.

[13] Ev "rojname" bi hecma xwe ji rojnameyê bêhtir wek "kovar"ê tê xuyakirin. M. Emin Bozarslan jî wek "kovar" dinirxîne. Lêbelê di lîteraturê de bi giştî di nav "rojname"yên kurdî de derbas dibe (Lewendi 1992; Kaya 2008; Acar 2010). Loma li vir jî wek rojname hatiye qebûlkirin.

[14] Kovara Rojî Kurd ligel hemançapên wê, tîpveguhezî û wergera wê ya tirkî ji hêla Koma xebatên Kurdolojiyê ve di sala 2013an de çap buye. Bnr. Koma Xebatên Kurdolojiyê –Kürdoloji Çalışma Grubu (amadekar-hazırlayan) (2013).

[15] Ji bo xebateke aktûel derbarê kovara Hetawî Kurd de bnr. Ahmet Alan (2017).

Di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de (1914-1918) wek gelek tiştî weşangeriya kurdî jî navberek daye û piştî şer di sala 1918an de kovara *Jîn*[16] dest bi weşanê kir ku ev kovar di "neteweperweriya kurd" de jî cihekî girîng digire (Özoğlu 2005).

Piştî kovara *Jînê*, di nav kovarên kurdî de ya herî bibandor kovara *Hawar*ê ye ku di sala 1932an de bi tîpên latînî dest bi weşanê kiriye û heta 1943an jî dewam kiriye. Kovar heta îro jî wek bingeha rastnivîs û gramera kurdiya latînî tê dîtin. Her weha kovara *Ronahî* jî dîsa di nav kovargeriya kurdî de cihekî sereke digire. Ew jî di sala 1942ande dest bi weşanê dike û heta 1945an jî weşana xwe didomîne. Her du kovar jî ku wek kovarên sirgûnê jî tên binavkirin (Acar 2013) ji aliye Celadet Ali û Kamiran Bedirxan li Şamê tên çapkirin.[17]

Ji aliye din ve gava mirov li kovargeriya kurdî ya li Komara Tirkiyeyê dinêre dîrokeke gelekî dûr nabîne. Ev yek bêguman bi pergal û nêrîna dewletê ve girêdayî ye lê dîsa jî di nav xwendekarên kurd de hewldanên tevgerên weşanê çêbune ku *İlerî Yurt* (1959) û *Deng* (1963) wek du mînakan dikarin bên destnîşankirin. Navbera salên 1959 û 1980î ji bo kurdan dema şiyarbûn û birêxistinbûnê bû ku ev yek jî bêhtir li derdora kovarên "sîyasî" pêk dihat û her yek ji van kovaran dibu dengê partî an jî rêxistinekê. Li gorî "rihê deme" ev rêxistin û her weha kovarên wan jî bi naveroka xwe "çep" bûn û mijarên wan jî bêhtir siyasî bûn (Acar 2013; bnr. Türkmen & Özmen 2014).



Darbeya leşkeri ya 12ê Îlona 1980î rê li ber her tiştî girt û heta salên 1990î jî weşangerî û kovargeriya kurdî ya kurdên Tirkiyeyê li bajarên Ewropa bi rê ve çû. Kovara *Nûdem* wek mînakeke sereke ya vê deme dikare bê nirxandin. Salên 1990î kovargeriya kurdî careke din ru dide û kovarên wek *Deng*[18], *Nûbihar*, *Rewşen* derdikevin meydanê. Lêbelê weşana kovarên niv-akademîk û akademîk ku di çarçoveya vê gotarê de tên nirxandin piştî salên 2010an dest pê dike.[19] Ev destpêkirin û geşedan bi guherînên siyasî, civakî û çandî ya Tirkiyeyê jî ve têkildar e. Guherînên siyasî yên Tirkiyeyê; rawestina pêvçûna çekdarî; biserketina partiya kurdan di hilbijartinên herêmî de; vekirina qenaleke bi kurdî di bin banê TRTê de, ji bo lêkolîn, xebat û nivîsandina derbarê kurdî de riya hinek platforman vekirin. Yek ji wan platforman jî kovarên nîv-akademîk û akademîk in ku mijara vê xebatê pêk tînin.[20]

---

[16] Tîpveguhezî û wergera kovara Jînê jî ji aliye M. Emin Bozarslan ve hatiye kirin û wek 5 cîldan li Swedê hatiye çapkirin.

[17] Hemû hejmarên kovara Hawarê ji nû ve wek du cîldan di sala 1998an de li Stockholm-Swêd ji aliyê weşanên Nûdem ve hatiye çapkirin. Hemu hejmarên Kovara Ronahî jî dîsa li Uppsala-Swêd ji aliyê weşanên Jîna Nu ve hatiye çapkirin. Ev çapên Swêdê li ser malpera Enstîtuya Kurdî ya Parîsê wek pdf dikarin werin daxistin. Bnr. http://bnk.institutkurde.org/catalogue/result.php?rech=liste 18.12.2017

Ji aliyê din, her du kovar jî li Tirkiyeyê ji nav weşanên *Belkî* careke din derketine.

[18] Kovara Deng jî kovareke temendirêj e û cara yekemîn di sala 1963an de dest bi weşanê kiriye û hatiye girtin. Sala 1989an careke din dest bi weşanê kiriye lê vê carê bêhtir wek kovareke girêdayî Partiya Sosyalîst a Kurdistan. Ji bo hejmara 100mîn û her weha dîroka kovarê bnr. http://psk-riyaazadi.org/images/deng/deng100.pdf lênêrîna dawî 19.12.2017

[19] Ji bo agahiyên derbarê hemû rojname û kovarên kurdî ku heta 2010an hatine çapkirin bnr. Acar (2010:562-584).

[20] Guherînên sîyasî, civakî û çandî û bandora wan li ser xebatên kurdî bi serê mijareke berfireh e. Loma li vir tenê amaje bi vê yekê hatiye kirin.

**2. Kovarên nîv-akademîk ên Kurdî**

Wek ku li jorê jî amaje pê hatiye kirin, kovarên akademîk ji "sazkirin"ê, heta lijneya kovaran bi rêzikên xwe; berpirsiyarî û pêvajoya nirxandin û weşandina gotaran, û her weha cihgirtina wan (an jî armanca wan) di "îndeks"an de xwedî pêvajoyeke cuda ne. Ev yek, ji aliyekî din ve bi pêwîstiyan, bi pêvajoya rewşa kurdî û weşangeriya kurdî ve jî girêdayî xuya dike.

Weşangeriya akademîk a kurdî li Tirkiyeyê jî di vê çarçoveyê de dikare bê nirxandin. Ji salên 1990î û vir de gelek kovarên kurdî hatine weşandin û di piraniya wan de jî xebatên "lêkolîn"ê hebune. Weşangeriya akademîk a kurdî li Tirkiyeyê jî bi vî rengî dikare bê nirxandin. Wek li jor jî amaje pê hat kirin *Deng*, *Rewşen*, *Nûbihar*, *War*, *Bîr*[21], *Bîrnebûn* mînakên sereke yên van kovaran e. Lê dikare bê gotin ku piştî vekirina enstîtuyan nêrîn û têgihiştina derbarê "lêkolîn", "xebatên akademîk" de jî hate guhertin. Bêgûman ne ev tenê, lê avakirina enstîtuyên zimanên zindî û vekirina beşên kurdî din banê van enstîtuyan de pêwîstiyên din bi xwe re anîn ku yek ji wan jî platformeke weşandina xebatên akademîk bû. Di vê çarçoveyê de, kovarên wek *Kovara Zarema*, *Wêje û Rexne* û *Ewro* (Zazakî) wek kovarên nîv-akademîk ên kurdî dikarin bên nirxandin. Ev kovar dikare bê gotin ku ji bo bersivdana pêwîstiyên deme derketine û hîna jî hem ji bo xwendekaran û hem jî bo xebatên kurdî xwedî roleke girîng in. Her çiqasî di van kovaran de hewldaneke "akademîk" bê xuyakirin jî, gava bi kovarên "akademîk" re miqayeseyek tê kirin, tê dîtin ku ji aliyê lijneya akademîk, rêzikname, pêvajoya qebûlkirina gotaran, nirxandin û weşandina wan, ji aliyê cîhgirtin an jî armanca cîhgirtina di îndeksan de ji kovarên "akademîk" cuda ne. Loma ev kovar dikarin wek nîv-akademîk bên nirxandin û di vê xebatê de jî bi vî awayî hatine binavkirin.



Ligel vê yekê, lijneyên kovarên ku dê di vê xebatê de bên destnişankirin (û wek kovarên akademîk hatine binavkirin) ji akademisyenan pêk tên, rêzikên wan li gorî standartên akademîk ên cîhanê hatine sazkirin, pêvajoya qebûlkirin, nirxandin û weşana gotaran dîsa li gorî rêzikên akademîk ên heyî hatine diyarkirin ku wan ji yên din cuda dike.

**3. Kovarên Akademîk ên Kurdî li Tirkiyeyê**

Kovarên akademîk ên bi kurdî an jî yên ku "xebatên kurdî" di wan de tên weşandinkêm in. Li derve, ji bilî *Journal of Kurdish Studies*, *Flitarica Kurdica* û *Journal of Middle Eastern Research- JMER* ku hejmara yekem nû derketiye, kovarên akademîk ên kurdî tune ne. Her weha li Herêma Kurdistanê (an jî bi navê fermî Hikumeta Herêma Kurdistan-Kurdistan Regional Goverment) jî kovarên "akademîk" ên zanîngehan hene. Wek mînak du kovarên bi navê *Science Journal of University of Zakho-JZS* û *Humanities Journal of University of Zakho-HJOUZ* ên Zanîngeha Zaxoyê; dîsa bi navê *ZANCO Journal of Zankoy Silemanî* jî kovareke zanîngeha Silêmanî hene. Wekî din zanîngehên din yên herêmê jî xwedî kovarên

[21] Di sala 2005an de hejmara yekemîn derketiye û hîna jî weşana xwê li ser malperê dewam dike. Bnr. http://kovarabir.com/

xwe yên akademîk in ku li derveyî mijara vê xebatê ne.[22] Li Tirkiyeyê di halê hazir de bi tevahî pênc kovar weşana xwe didomînin û di nav van kovaran de ya ku herî pêşî dest bi weşanê kiriye û di vî warî de rêyek vekiriye *Nûbihar Akademî* ye.

### 3.1. Nûbihar Akademî

Nûbihar, di heman deme de navê weşanxaneyekê ye ku di sala 1992an de hatiye avakirin. Her weha di heman salê de dest bi weşana kovareke bi navê *Nûbihar* jî kiriye. *Nûbihar Akademî* jî bi peywendî û alikariyên vê pêvajoyê ve girêdayî, dîsa di bin banê heman weşanxaneyê de di sala 2014an de dest bi weşana xwe dike ku dibe yekemîn kovara kurdî ya "akademîk" û bihekem li Tirkiyeyê. Derketina *Nûbihar Akademî*, wek li jor jî hatibû gotin, bi pêwîstiyên demê yên *xebatên kurdî* ve girêdayî xuya dike. Vekirina enstîtuyên zimanên zindî û di bin banê wan de beşên ziman û çanda Kurdî pêwîstiyeke platformên akademîk jî bi xwe re aniye ku *Nûbihar Akademî* wek encameke van pêwîstiyan derketiye holê. Ev yek di hejmara yekemîn de dikare bê dîtin. Edîtorê kovarê Abdurrahman Adak, ku wê deme- û niha jî- mamosteyê Beşa Kurdî ya Enstîtuya Zimanên Zindî ya Mardin Artukluyê bû, di hejmara yekemîn de di derbarê derketin û armanca kovarê de wiha dinivîse:

> Aşkera ye ku di vê qonaxa xebatên Kurdî de, pêwistî bi kovareke bihekem û akademîk heye ku bi Kurdî û Îngilîzî weşanê bike. (…) Li aliyekî dî di salên dawî de li hinek zanîngehên Tirkiyeyê di warê xebatên Kurdî de bernameyên lîsansa bilind vebûne û ji bo ku mamoste û xwendekarên van bernameyan gotarên xwe yên akademîk biweşînin pêwîstî bi derxistina kovareke akademîk çêbûye. Faktorên bi vî rengî kir ku ji bo derxistina Nûbihar Akademiyê gavên pêwist bên avêtin.(…) Nûbihar Akademî li ser mîrata tecrubeya weşanxaneya Nûbiharê, dixwaze di warê kovargeriya akademîk a xebatên Kurdî de bibe pêşeng û bibe platformeke objektîf ku hemû lêkolîner xebatên xwe yên akademîk tê de biweşînin (Adak 2014).



Heta niha 6 hejmarên kovarê derketine û zimanê gotaran jî kurdî (tevî hemû zaravayan) û ingilîzî ye. Ya ku wê ji kovarên din cuda dike jî ev zimanê kovarê ye. Xwendekar û lêkolîner dikarin gotarên di jimareyên kovarê de hatine çapkirin, li ser malperê jî bixwînin.[23]

[22] Kovarên akademîk ên Zanîngehên din ên herêmê hene, lê ji bo ku mijar raste rast bi wan ve ne girêdayî ye, li vir tenê behsa wan hatiye kirin. Ji bo agahiyên berfireh derbarê van kovaran de bnr. Kovarên Zankoya Zaxo: Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ) http://hjuoz.uoz.edu.krd/index.php/hum/index; Science Journal of Universtiy of Zakho: http://sjuoz.uoz.edu.krd/index.php/sci/index
Ji bo kovara Zankoya Duhok: The Journal of The University of Duhok (JUD): http://journal.uod.ac/index.php/uodjournal ;
Ji bo kovara Zankoya Silêmanî: Journal of Zankoy Sulaimani (JZS): http://jzs.univsul.edu.iq/
Ji bo kovara Zankoya Selahaddîn ZANCO: http://su.edu.krd/media/zanko-press

[23] Ji bo agahiyên zêdetir, naverok û gotaran bnr. http://nubiharakademi.com/ 24.08.2017; Hêjayî gotinê ye ku kovar di destpêka 2018an de derbasî nav dergipark.gov.tr bûye.

### 3.2. IJOKS (International Journal of Kurdish Studies)

Kovareke din a akademîk a Kurdî jî *Kovara Navnetewî ya Xebatên Kurdî* an jî bi navê wê yî resen *International Journal of Kurdish Studies-IJOKS* e. Ev kovar tenê dîjîtal e û piştî *Nûbihar Akademî* duyemîn kovara akademîk a kurdî li Tirkiyeyê ye. Kovar her çiqasî di sala 2014an de hatibe avakirin jî yekemîn hejmara kovarê di meha çile ya 2015an de diweşê û heta niha jî heft (7) hejmar derketine. Gotarên di kovarê de weşiyane heta niha bi zimanê kurdî (tevî zaravayê wê), tirkî, ingilîzî ne. Ligel vê yekê, heta niha di kovarê de bi rûsî jî gotarek hatiye weşandin.

Li gorî agahiyên li ser malperê û herweha agahiyên ji edîtorê kovarê hatine wergirtin armanca derketina kovarê û qada wê; derbarê ziman(ên) û gelên kurd(an) de pêşkêşkirina xebatên resen e. Ligel vê yekê, kovar mijarên derbarê têkiliya kurdî/kurdan bi qadên wek Rojhilata Navîn, Mesopotamia, Asyaya Navîn, Qefqas û Ewropa de jî qebûl dike.

Kovar ne girêdayî tu saziya ye û heta hejmara 6an jî bi edîtoriya Hasan Karaca derketiye, lê di hejmara dawî de guhertinek çêbuye û edîtorê wê wek Salih Akın xuya dike.[24]

### 3.3. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi (Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê)

*Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* -Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê- yekemîn kovar e ku wek fermî ji hêla enstîtuyeke Zimanên Zîndî ve hatiye weşandin û çapkirin. Hejmara yekem ya kovarê di sersala 2015an de derdikevê û heta niha 4 hejmar derketine.[25] Edîtorê kovarê M. Zahir Ertekin armanca derketina kovarê wiha tîne ziman;



> Kêmbûna kovarên akademîk yê ku bi kurdî an jî li ser kurdolojiyê weşanê dikin yek ji wan sebeban e ku kovara me dest bi weşanê kir. Bi vê mebestê dixwaze qadekî ji akademisyenan re veke da ku gotarên xwe yên akademîk bidin çapkirin û li ser kurdan û kurdî çavkaniyekê dirist bike.[26]

Li gorî agahiyên ji êdîtorê kovarê, Dr. M. Zahir Ertekîn, hatine wergirtin, kovar ji şeş mehan carekê (salê du hejmar) derdikeve û bi "7 *zimanan*, kurmancî, soranî, zazakî, farisî, îngilîzî, erebî, tirkî û almanî" gotaran qebûl dike. Lê gava mirov li kovarê dinêre tenê gotarên bi kurdî (ligel zaravayan), û tirkî xuya dikin. Her weha dîsa ji agahiyên li ser malpera kovarê tê dîtin ku di kovarê de –û her weha di enstîtuyê de- "zazakî" ji zaravayeke kurdî bêhtir wek "ziman"ekî tê dîtin. Kovar

---

[24] Ji bo agahiyên berfireh derbarê kovarê de û her weha ji bo hejmarên kovarê bnr. http://www.ijoks.com/ 25.08.2017

[25] Di dema amadekirina vê xebatê de tenê 4 hejmar derketibûn û li ser malpera dergipark jî tenê 2 hejmar xuya dikirin. Niha 6 hejmarên kovarê derketine û hemû jî li ser malpera dergiparkê dikarin bên bidestxistin. Bnr. http://dergipark.gov.tr/buydd (30.03.2018).

[26] Ji hevnivîsandina li ser maîlê ya bi edîtorê kovarê Doç. Dr. M. Zahir Ertekin re. 18.08.2017

hem dijîtal û hem jî çapkirî diweşe û hejmarên wê jî wek dijîtal dikarin bên bidestxistin. [27]

### 3.4. JMS (The Journal of Mesopotamian Studies)

Kovareke din a akademîk a kurdî ku vê dawiyê dest bi weşanê kiriye jî *The Journal of Mesopotamian Studies –Kovara Xebatên Mesopotamî-JMS* ye. Kovar ji hêla Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê ve tê derxistin. Damezrîner û edîtorê yekem ê kovarê Mustafa Öztürk bingeha derxistina kovarê weha tîne ziman;

> Piştî damezirandina van beşan lêkolînvanî û akademîsyentiya kurdî êdî ji atmosfera amatortiyê qelibî ser zemîneke cidîtir. Helbet akademîsyentî hebe divê çapgerî jî hebe. Akademîsyenên ku bi kurdî dinivîsînin an jî li ser mijarên kurdolojiyê dinivîsînin hewcetiyê bi kovarên kurdî dîtin; qe nebe diviya ku xebatên xwe yên, çi bi zimanê kurdî û çi li ser mijarên kurdî, li derekê bidin çapdayin.

Kovar, salê du caran derdikeve û ji ber ku di bin banê enstîtuye de sê beş hene (kurdî, erebî, suryanî) gotarên di kovarê de tên weşandin jî têkildarî xebatên van beşan e. Dîsa bi vê yekê ve têkildar kovar pêşekiyê dide gotarên bi zimanê kurdî, erebî û suryanî, lê yên ingilîzî û tirkî jî qebûl dike. Ligel vê yekê heta niha di kovarê de gotarên kurdî, erebî û tirkî tên dîtin, yên bi suryanî û ingilîzî nehatine weşandin.



Kovar hem çapkirî û hem jî wek dijîtal dikare bê bidestxistin û heta niha 3 hejmar derketine.[28]

### 3.5. Derwaze

Kovara Derwaze di nav van kovarên navborî de ya ku herî dawî derketiye. Her çiqasî hatibe diyarkirin ku dê di sersala 2016an de derbikeve jî, hejmara yekem di gulana 2017an de bi halê çapkirî pêşkêşî civaka akademiya kurdî hatiye kirin.[29] Dîsa di nav kovarên navborî de, ji bilî IJOKS- ku rewşa wê jî hinek cuda ye ji yên din-ya ku ne girêdayî saziyekê ye, û serbixwe derdikeve kovara Derwaze ye. Yeke din ku kovarê ji yên berî xwe cuda dike jî zimanê gotarên kovarê ye. Kovar tenê bi kurdî (piranî jî bi kurmancî û soranî) gotaran diweşîne ku bi vî awayî dixwaze di nav zaravayên kurdî de danûstandinekê çê bike. Ev yek di "peşgotin"a kovarê de wiha tê îfadekirin;

> *Derweza* bi tenê nivîsarên bi kurdî belav dike, bi piranî bi kurmancî û soranî, ku bi vî rengî dixwaze danûstandinên hizrî û têgehî bi rengekî konsantre bi rê ve biçin û her hejmareke kovarê ji bilî pêşkêşkirina

---

[27] Ji bo agahiyên zêdetir û gotaran bnr. http://dergipark.ulakbim.gov.tr/buydd/index (24.08.2017) û bnr. jerenot 25.

[28] Ji bo agahiyên derbarê kovarê û her weha hejmar û mijarên di kovarê de bnr. http://jms.artuklu.edu.tr/; JMS jî bi hejmara 3yan derbasî ser dergiparkê buye û ji wir dikarê bê şopandin. Ji bo agahiyên nûjentir û hemû gotaran bnr. http://jms.artuklu.edu.tr/ (30.03.2018).

[29] Ji bo îlana gotaran bnr. http://zanenstitu.org/wp-content/uploads/2015/04/Derwaze_Leaflet_ENG.pdf 25.08.2017

> hejmareke nivîsarên bi wesfên zanistî herwiha bibe meydaneke çalak a bikaranîna şêwezarên kurdî di warên zanistî de (Edîtoriya Derwaze 2017:6).

*Derwaze*, her weha, xwe weke “kovareke zanistên civakî” bi nav dike û gotarên ji hemû binbeşên zanistên civakî jî qebûl dike. (r.6).

Kovarên akademîk ên kurdî yên li Tirkiyeyê tên çapkirin an jî weşandin ev in. Ji bilî van kovaran, bi navê *Kurdiyat* kovareke Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Wanê li ser malpera giştî ya kovaran xuya dibe, lê tenê wek nav e, weşan tune ye.[30]

**4. Pirsgirêkên weşangeriya akademîk**

Kovarên akademîk ên kurdî ku li Tirkiyeyê diweşin heta niha tenê 5 heb in û ev jî dide xuyakirin ku kovargeriya kurdî ya akademîk hîna di asta destpêkê de ye. Ji ber vê yekê jî hinek pirsgirêk derdikevin meydanê. Ji bilî pirsgirêkên teknîkî wek çapkirin, dizayn, font û tiştên din, pirsgirêkên "akademîk" ên sereke ku ji aliyê edîtorên kovaran ve hatine bilêvkirin jî bi giştî “asta akademîk ya gotaran, kêmbûna hekeman, kêmbûna gotaran û her weha kêmbûna gotaran” e.

Ligel ku heta niha di enstîtuyên zimanên zindî de hejmarek (zêdeyî 120 heban. Bnr. Aykaç 2017) tezên masterê û bi sedan “proje”yên mastera bêtez hatine amadekirin û parastin jî, neşandin, an jî nenivîsandina gotaran tiştekî balkêş xuya dike.



Li gorî bersivên ji edîtorên kovaran hatine wergirtin (li ser pirsiyariya ji wan re hatiye şandin) û her weha li gorî tecrubeyên şexsî yên kesekî ku edîtoriya kovarekê kiriye pirsgirêkên kovarên akademîk ên kurdî weha dikarin bên vegotin;

Ya sereke wek “şêweya akademîk”, an jî “kêmbûna nirxên akademîk” ên gotaran derdikevê meydanê, ku ew jî bi kurtasî dikare wek objektivite, kûrbûna li ser fikrekî, palpiştkirina wê fikrê bi referansan, û derxistana encamekê bê binavkirin. Ev yek dikare wek pirsgirêkeke "metodolojîk" bê binavkirin. Ev yek jî encax bi helberîna zanîna li ser nirxên rêbaz û standartên akademîk ên navnetewî dikare bê çareserkirin (Öpengin 2014: 29).

- Dîsa –belkî bi vê sedemê ve têkildar- “asta akademîk” ya gotarên ku tên hinekî lawaz dimîne û ew jî karên edîtoran zehmettir dike, ku çend caran gotar ji bo nivîskar tê şandin heta hinekî rast bibe û bikeve halê gotarekê de. Edîtorê kovara *Derwaze* Ergin Öpengin vê pirsgirêkê weha tîne ziman;

> Bi taybetî bo kurmancî nebûna hejmareke kafî ya wan nivîskaran e ku dikarin bi rengekî bisteh û serbixwe shêwazên derbirrînên akademîk di kurdî de bi kar bînin/peyrew bikin û metnên zanistî binivîsin. Herwiha asta nizm a xwendewariya zanistî, hem ji layê nivîseran ve û hem ji layê

[30] Di malpera dergiparkê ku gelek kovarên zanîngehan dihewînê de navê kovarê derbas dibe, lê tu agahiyên zêde tune ne. Bnr. http://dergipark.gov.tr/ydekd lênerîna dawî: 18.12.2017.

daweran ve, dike ku di pênavê "akademîk"iyê de tishtên pir dûrî rêbazên zanistî-akademîk bêne belavkirin.[31]

- Pirsgirêkeke din ku ji aliyê edîtoran ve hatiye îfadekirin jî "kêmbûna hekem"an e. Nirxandina gotaran û her weha hekemtî tişta herî girîng e ji bo kovarên akademîk û kêmbûna wan bivê nevê pirsgirêkan bixwe re tînin. M. Zahir Ertekîn derbarê vê yekê de weha dibêje;

...peydakirina hakemên hin qadan bi rastî jî pirr zehmet e. Ji ber ku hakem divê hem bi zimanê gotarê bizanibe hem jî derbarê babeta gotarê de serwext be. Carinan ji ber van tiştên navborî em zehmetiyan dikişînin.

Di derbarê hekemtiyê de ji tecrubeyên şexsî tê dîtin ku carinan jî hin kesên di warê xwe de pispor naxwazin hekemtiyê bikin an jî gotaran binirxînin. Ev yek dibe ku girêdayî "neêminbûn"ê be. Ji ber ku temenê kovarên akademîk ên Tirkiyeyê gelekî kin e û heta wextek di ser re derbas nebe, an jî kovar nekeve "index"an de akademisyen naxawzin tevî vê proseyê bibin, an jî wext ji bo nirxandina gotarên van kovaran re naveqetînin.

- Pirsgirêkeke din ku dîsa bi kinbûna temenê kovaran re têkildar jî ew e ku şandina gotaran ji bo kovaran kêm e. Ligel ku heta niha di enstîtuyên zimanên zindî de hejmarek (zêdeyî 120 heban. Bnr. Aykaç 2017) tezên masterê û bi sedan "proje"yên mastera bêtez hatine amadekirin û parastin jî, neşandin, an jî nenivîsandina gotaran tiştekî balkêş xuya dike.



Ji aliyê din ve şandina gotarekê ji bo kovareke akademîk girêdayî hinek tişên din jî xuya dike. Wek mînak cihgirtina kovarê di îndeksan de; karîgeriya wê bo pêvajoya doçentiyê û her weha di nirxandina "teşwîqa akademîk"[32] de bandorê li ser şandina gotarekê dike. Ji aliyê din ve ev sedem bi serê xwe vê pirsgirêkê rave nakin ji ber ku heta niha di enstîtuyên zimanên zindî de hejmarek tezên masterê hatine amadekirin û parastin û bi sedan projeyên mastera bêtez hatine amadekirin, lê dîsa jî gotar kêm tên şandin. Dibe ku ev yek bi kêmtecrûbeya nivîsandina akademîk ve, an jî bi giştî bi nenivîsandinê ve girêdayî be. Wek mînak edîtorê kovara IJOKS dibêje ku ligel ku kovara wan di îndeksan de cih digire jî dîsa "lêkolîner xebatan naşînin" û dipirse gelo akademîsyenên kurd "gotaran nanivîsin?". Loma kêmtecrûbeya nivîsandina akademîk jî wek pirsgirêkekê dikare bê nirxandin.

Her weha belavkirin û firotin jî wek pirsgirêk derdikevin pêşiya van kovaran. Ev yek bêguman ji bo kovarên serbixwe yanî ên negirêdayî zanîngeh an jî enstîtuyan derbasdar e. Di vê xalê de ya ku pirsgirêkan dijî kovara *Derwaze* ye. Li

---

[31] Ji hevnivîsandina li ser maîlê. 08.09.2107

[32] "Teşwîqa akademîk" (akademik teşvik): Rêbazeke van salên dawî ji hêla YOKê ve hatiye sepandin ji bo hejmara weşanên akademîk zêde bibin. Li gorî vê sepandinê, akademîsyenê ku wê salê ji 30 pûanî zêdetir sitandibe, sala dahatû her meh xelateke malî werdigire. Li gorî vê sepandinê, kovara ku gotar tê de hatiye weşandin divê herî kêm 3 salî be. Ev yek jî ji bo kovarên kurdî astengeke gelekî mezin e ji bo niha.

gorî îfadeyên edîtorê kovarê; ji ber ku kovar negirêdayî tu saziyan e, hem ji aliyê çapkirinê û hem jî ji hêla belavkirinê ve pirsgirêkên wê hene. IJOKS, ji ber ku dîjîtal e ji hêla çapkirin û belavkirinê de tu pirsgirêkên wê tune ne. *Nûbihar Akademî* ji ber ku di bin banê weşanxaneyekê de derdikeve derfetên çapkirin û belavkirinê li gorî yên din baştir xuya dike. Ji aliye din ve ji ber ku kovarên wek *JMS*, *Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Bîngolê* girêdayî saziyekê ne qet nebe pirsgirêkên madî tune ne ji bo wan. Ligel vê yekê, li gor edîtorên kovaran, belavkirina kovaran jî pirsgirêkeke sereke ye.

Bêguman neşandina gotaran bo van kovarên navborî, kêmbûna hekeman, asta akademîk ya gotaran û pirsgirêkên din bi rewşa giştî ya akademiya kurdî ve jî girêdayî ye. Edîtorê Nûbihar Akademî Abdurrahman Adak di bersiva xwe ya derbarê vê mijarê de de wiha dibêje:

> Li Tirkiyeyê akademiya Kurdî lawaz e, tecrubeya wê jî tuneye. Kesên ku hem xwediyê formasyona akademîk in, hem jî di akademiyê de zimanê kurdî bi kar tînin gelekî hindik in. Bi taybetî di qadên kurdî de kesên xwediyê van wesfan gelekî kêm in. Bêguman ev rewşa nerênî bivênevê rengê xwe dide weşangeriya akademîk jî. Lewra girseya ku gotarên akademîk dinivîsîn jî û girseya ku van gotaran dinirxînin jî ev girse ye.[33]

**Encam**

Weşan ji bo zindîbûna ziman û belavbûna wî di nav civakê de tiştekî girîng e û bi saya weşanê di nav civaka ku dikarin bi wî zimanê bixwînin têkiliyek çêdibe. Weşangeriya akademîk jî heman têkiliyê di nav civaka akademiyê de pêk tîne. Di destpêka weşangerî û kovargeriya akademîk de jî heman helwest û armanc tên dîtin. Weşangeriya kurdî bi heman heman armanc û helwestan dest pê kiriye û di pêvajoyeke dûv û dirêj û hinekî derengmayî gihaşt asta kovargeriya akademîk.



Weşangeriya kurdî ku bi rojnameya *Kurdistan* ya di sala 1898an dest pê dike, di salên 1913an de bi weşana kovarên wek *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, û *Yekbûn* gihaşte asteke din. Her weha kovara *Jîn* a ku di 1918an de dest bi weşanê kir jî di dîroka kovargeriya kurdî de cihekî girîng digire.

Di navbera salên 1960-80yî de kovargeriya kurdî bêhtir girêdayî rexistinên siyasî ye û loma naveroka wan jî siyasî ye. Piştî 12ê Îlona 1980î mekanê weşangerî û her weha kovargeriya kurdî dibe welatên Ewropî.

Di salên 1990î û wir de kovargeriya kurdî li Tirkiyeyê careke din rû dide û gelek kovar têne weşandin. Bi vekirina enstîtuyên zimanên zindî pêwîstiya kovarên akademîk derdikeve meydanê û ev enstîtu û beşên kurdî her weha dibin bingeh ji bo van kovarên akademîk ku bûne mijara vê xebatê.

Li Tirkiyeyê di halê hazir de pênc kovarên akademîk weşana xwe didomînin. Di serî de *Nûbihar Akademî* ku serkêşiya vî karî kiriye, *Kovara Enstîtuya Zimanên*

[33] Ji hevnîvîsandina li ser maîlê 09.09.2017

*Zindî ya Bîngôlê, IJOKS (International Journal of Kurdish Studies), JMS (The Journal of Mezopotamian Studies)*, û ya dawî *Derwaze* ev kovar in ku di qada kurdî de bi rêgezên akademîk gotaran diweşînin. Ligel ku beşên kurdî û xwendekarên lisansa bilind (bêtez û bitez) û doktorayê jî zêde dibin, ev hejmara kovaran dide xuyakirin ku kovargeriya akademîk a li Tirkiyeyê hîna di asta "destpêk"ê de ye. Ji ber vê yekê jî rûbirûyê hinek pirsgirêkên wek *kêmbûna hekeman, kêmşandin an jî kêmnivîsandina gotaran bo kovaran, lawazbûna asta akademîk* ya gotaran wek pirsgirêkên sereke derdikevin meydanê ku di heman demê de bi rewşa giştî ya akademiya kurdî li Tirkiyeyê ve girêdayî ye.

Ligel van pirsgirêk û kêmasiyan kovarên akademîk ên kurdî di nav civaka akademiya kurdî de roleke girîng digirin ser xwe. Di van kovaran de akademîsyenên kurd/qada kurdî wek edîtor, nivîskar, hekem û xwîner cih digirin û bi vê yekê hevdû nas dikin, bi hevdu re têkiliyekê dideynin.

Her weha, îro ji van kovaran navborî 4 jê li ser malpera dergiparkê dikarin bên dîtin, daxistin û xwendin. Loma dikare bê gotin ku bi saya van kovarên akademîk di nav akademisyenên kurd/qada kurdî de têkiliyek çêdibe. Ji aliyên din ve bi saya van kovaran ne tenê di nav akademisyenan de lê bele di navbera akademisyenên kurd/qada kurdî û xwîneran de jî têkiliyek çêdibe. Ev tev jî ji bo berdewamî û pêşketina civaka akademiya kurdî gelekî bi qedr û qîmet in.



Loma, wek encam dikare bê gotin ku weşandina kovarên akademîk ên kurdî li Tirkiyeyê di dîroka weşangerî û kovargeriya kurdî de xaleke nû ye û bi pêwîstiyên demê û bi rewşa giştî ya akademiya kurdî ve jî têkildar e. Ev her du qad hevdu xwedî dikin û pêş de dibin. Çawa ku hebûna enstîtuyan û perwerdeya bilind rê li ber "kovarên akademîk" vekir, zêdebûna kovarên akademîk jî dê "akademiya kurdî" geştir bike. Ji bo vê yekê jî weha xuya dike ku pêwîstî bi danûstandinên zêdetir ên di navbera edîtor, nivîskar, hekem û xwendekarên van kovaran de heye.

**Spasî:**

*Di amadekirina vê xebatê de ji bo bersivdana pirsan û parvekirina agahiyan ez spasî Doç. Dr. Abdurrahman Adak (Nûbihar Akademî), Doç. Dr. M. Zahir Ertekin (Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Bîngolê), Doç. Alk. Mustafa Öztürk (Yekemîn Edîtorê Kovara JMS), Dr. Hasan Karaca (Yekemîn edîtorê IJOKS), Dr. Ergin Öpengin (Edîtorê Derwaze), Dr. Zülküf Ergün (Endamê Lijneya JMS) dikim.*

**Referans**

Acar, H. (2010). Di Serdema Komara Tirkîyê Rewşa Kovarên Kurdî. Di nav, *Mecmû'a-ê Meqalatê Nexwostîn Hemayeşê Beynelmilelî*, Danişgehê Kurdistan, Îran, 2010, r. 562-584.

Adak, A. (2014). Ji edîtor. *Nûbihar Akademî,* c.1, h. 1. r. 7

Akbulut, U. (2016). Bilimsel Dergiler İlk Kez 1665'te Çıktı. http://www.uralakbulut.com.tr/wp-content/uploads/2016/12/ (28.03.2018).

Alan, A. (2017). *Hetawî Kurd (1913-1914)*. İstanbul: Avesta

Anderson, B. (2004). *Hayali Cemaatler: Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması* (çev. İ. Savaşır). 3. bsm. İstanbul: Metis

Arslan, M. (2015). Kurd, Kitêb, Çapxane: Weşangeriya Kitêbên Kurdî Di Dewra Osmaniyan De (1844-1923). Stenbol: Peywend

Aykaç, Y. (2017). Bîbliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê Yên Li Tirkiyeyê (2011-2016). The *Journal of Mesopotamian Studies (JMS)* vol. 2, no.1, r. 119-135.

Bozarslan, M. E. (1991). Kurdistan: Rojnama Kurdî ya Pêşîn-İlk Kürt Gazetesi I-II. Uppsala: Deng

Bozarslan, M. E. (1998). Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi- Kovara Kurdî-Tirkî 1908-1909. Uppsala: Deng

Çınar, H. (2010). Vakıflar Genel Müdürlüğü Yayınları Katalogu. Vakıflar Dergisi, hj.35, r.179-187. http://acikerisim.fsm.edu.tr:8080/xmlui/bitstream/handle/11352/846/%C3%87%C4%B1nar.pdf?sequence=1&isAllowed=y (12.04.2018).

Çiçek, C. (2013). Zimanek Çime Tê Qedexekirin? Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkiyeyê- Ji înkarê Ber bi Nasînê. Stenbol:Peywend

Edîtoriya Derwaza (2017). Pêşgotin: Çarçove û Armancên Derwazeyê.*Derwaze*, hejmar.1, r. 6-8.

Gökçe, B. (2012). *Toplumsal Bilimlerde Araştırma*. çapa 6mîn, Ankara: Savaş Yayınevi

Issı, M. (2013). Kürt Basını ve Kürdistan Gazetesi (1898-1902). *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* -www.e-sarkiyat.com- Sayı:IX, r. 127-147. http://dergipark.gov.tr/download/article-file/116013 20.08.2017



Kaya, F. (2008). *Osmanlı Döneminde Kürt Basını*. İstanbul: Marmara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü (Teza lisansa bilind a çapnebûyî).

Kaya, H. (2012). *Doğu'nun Elçisi'nden Yüce Divan'a Şerafettin Elçi* (röporaj). İstanbul: Fanos Yayınları.

Kolata, G. (2013). Scientific Articles Accepted (Personal Checks, Too). The New York Times. https://www.nytimes.com/2013/04/08/health/for-scientists-an-exploding-world-of-pseudo-academia.html (28.03.2018)

Koma Xebatên Kurdolojiyê-Kürdoloji Çalışma Grubu (Amd-Hzr.) (2013). *Di Sedsaliya wê de Rojî Kurd*. İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları

Korkmaz, Z. (2001). Bilim Dili ve Türkçe, *Türk Dili Dil ve Edebiyat Dergisi,* C: 2001/II, S: 595, s. 7-19. http://www.tdk.gov.tr/images/css/TDD/2001s595/2001_595_02_Z_KORKMAZ.pdf

Kozak, N. (2003). Türkiye Akademik Dergiler Rehberi-2002. Nazmi Kozak. Ankara: Detay Yayıncılık.

Kozak, N. (2017). Türkiye'deki bilimsel/akademik dergilerin durumu. http://www.egitimajansi.com/haber/turkiyedeki-bilimselakademik-dergilerin-durumu-haberi-61167h.html (28.03.2018).

Lewendî, M. (1992). Li Kurdistana Bakur û Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî. Ankara: Özge.

Malmîsanij, M. (2007). The Past and the Present of Book Publishing in Kurdish Language in Turkey and Syria. Istanbul: Wate.

ORSAM (2013). Orsam 5 Yaşında!. *OrtadoğuAnaliz,* c.5, hj.60, r. 8-17. http://eds.b.ebscohost.com/eds/pdfviewer/pdfviewer?vid=1&sid=2072ac99-f3fc-4bd1-987e-6865084adb6b%40sessionmgr102 (12.04.2018).

Öpengin, E. (2014). Tevatür ve Temellük Kıskacında Kürt Kültür Tarihçiliği. *Kürt Tarihi*, (Şubat-Mart 2014), r. 18-29.

Özel, A. M. (2017). Türkiye'de Tasavvuf Yayıncılığının Bugünü: Gözlemler, Öneriler. Academic Platform Journal of Islamic Research (APJIR), c.1, hj.2, r.19-23. http://dergipark.gov.tr/download/article-file/402449 (12.04.2018).

Singleton, A. (2014). The First Scientific Journal. Learned Publishing, 27: 2–4. https://doi.org/10.1087/20140101

Şenalp, M. G. (2016). Kafirlik ve Sapkınlık Arasında Kurumsal İktisat. *İktisat ve Toplum*, hj. 65, r.24-32. http://www.academia.edu/22177261/_2016_Kafirlik_ve_Sapk%C4%B1nl%C4%B1k_Aras%C4%B1nda_Kurumsal_%C4%B0ktisat_%C4%B0ktisat_ve_Toplum_Say%C4%B1_65_ss._24-32 (12.04.2018).

Şentürk, M. (2014). Turgut Cansever Düşüncesinde Şehrin Değişimi. *İnsan ve Toplum*, c.4, hj. 7, r. 25-56 **DOI:** dx.doi.org/10.12658/human.society.4.7.M0099 (12.04.2018).



The Royal Society (2015). Philosophical Transactions: 350 years of publishing at the Royal Society (1665–2015). https://royalsociety.org/~/media/publishing350/publishing350-exhibition-catalogue.pdf (28.03.2018).

Tüfekçi, H. K. (2011). Vakıf ve Kültür Dergisi Makaleler Bibliyografyası. *Vakıflar Dergisi,* hj. 35, r. 249-255. http://acikerisim.fsm.edu.tr:8080/xmlui/bitstream/handle/11352/875/Kaleli%20T%C3%BCfek%C3%A7i.pdf?sequence=1&isAllowed=y (12.04.2018).

Türkmen, A. E. & Özmen, A. (amd.) (2014). *Kürdistan Sosyalist Solu Kitabı, 60'lardan 2000'lere Seçme Metinler.* Ankara: Dipnot Yayınları

Ulus, A. T. (2013). Bilimsel Yayıncılığın Diğer Yüzü. *Sağlık Bilimlerinde Süreli Yayınclık Sempozyumu*-2013. http://uvt.ulakbim.gov.tr/tip/sempozyum11/Sayfa-47-49.pdf (28.03.2018).

**Malper:**

**Malperên Kovaran:**

Kovara *Bîr*: http://kovarabir.com/

*Nûbihar Akademî*: http://nubiharakademi.com/

*Science Journal of Universty of Zakho* ya Zanîngeha Zaxo: http://sjuoz.uoz.edu.krd/index.php/sci/index

*Humanities Journal of University of Zakho: http://hjuoz.uoz.edu.krd/index.php/hum/index*

*Journal of Duhok University*: http://journal.uod.ac/index.php/uodjournal

*Journal of Zankoy Slemani*: http://jzs.univsul.edu.iq/
*Journal of Kurdish Studies:* http://www.kurdishstudies.net/
*Journal of Middle Eastern Research-JMER:* http://www.iisks.com/journal/jsks/#1476016310009-db63ae8b-a7df
http://su.edu.krd/content.php?topic=77&articleNo=159&lang=en
https://nubiharblog.wordpress.com/nubihar/
*Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi:* http://dergipark.ulakbim.gov.tr/buydd/
*The Journal of Mesopotamian Studies*: http://jms.artuklu.edu.tr/
*The Journal of International Kurdish Studies:* http://www.ijoks.com/
*Yüzüncü Yıl Üniversitesi Kürdiyat Dergisi:* http://dergipark.gov.tr/ydekd
ZANCO (Kovara Zanîngeha Selahadîn): http://su.edu.krd/media/zanko-press

**Yên din:**
*Pirtûkxaneya dîjîtal ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê*: http://bnk.institutkurde.org/?l=fr
http://zanenstitu.org/wp-content/uploads/2015/04/Derwaze_Leaflet_ENG.pdf